



MEDENİYETLER
KAVŞAĞINDA BİR KENT
SİVEREK

Dil | Din | Edebiyat

Editörler
İbrahim ÖZCOŞAR
Ahmet KIRKAN
Ekrem AKMAN
Abdusselam ERTEKİN

MEDENİYETLER KAVŞAĞINDA BİR KENT: SİVEREK

DİL-DİN-EDEBİYAT

Editörler

İbrahim ÖZCOŞAR

Ahmet KIRKAN

Ekrem AKMAN

Abdusselam ERTEKİN

Çizgi Kitabevi Yayınları:1416
Tarih

©Çizgi Kitabevi
Ekim 2022

ISBN: 978-605-196-865-0
Yayıncı Sertifika No:52493

KÜTÜPHANE BİLGİ KARTI
- Cataloging in Publication Data (CIP) -
Editörler

ÖZCOŞAR, İbrahim | KIRKAN, Ahmet
AKMAN, Ekrem | ERTEKİN, Abdusselam
MEDENİYETLER KAVŞAĞINDA BİR KENT: SİVEREK
DİL-DİN-EDEBİYAT

Makalelerin sorumluluğu yazarlara aittir.

Siverek Belediyesi'nin katkılarıyla basılmıştır.
Kapak Fotoğrafları Hüseyin Demirbağa Aittir.

Baskıya Hazırlık: Çizgi Kitabevi Yayınları
Tel: 0332 353 62 65- 66

Baskı: Sebat Ofset
Sertifika No: 46039

ÇİZGİ KİTABEVİ

Sahihiata Mah. | Alemdar Mah.
M. Muzaffer Cad. No:41/1 | Çatalçeşme Sk. No:42/2
Meram/Konya | Çağaloğlu/İstanbul
(0332) 353 62 65 - 66 | (0212) 514 82 93

www.cizgikitabevi.com
/ cizgikitabevi

İÇİNDEKİLER

TAKDİM / Ayşe ÇAKMAK	9
TAKDİM / Aziz GÖLBAŞI	11
YILMAZ KARAKOYUNLU'NUN SALKIM HANIM'IN TANELERİ ROMANININ BENLİK-ÖTEKİLİK HALLERİ AÇISINDAN ÇÖZÜMLENMESİ	13
Yunus CENGİZ	
AHMED ARİF'İN ŞİİRLERİNDE VAROLUŞU DURUMLAR	25
Necip UYANIK	
SÊWREGI DE ZIWAN Û DIMİLÎ	37
Haydar DILJEN	
QERTAFÊN DARİŞTÎNÊ DI ZAZAKÎYA SÊWREGÊ DA	47
Fahri KARACA	
HIZIR MİTOSU ÜZERİNE BİR ÇÖZÜMLEME: SİVEREK ÖRNEĞİ	71
Büşra GÖKALP	
SÊWREGI RA TAYE NUMÛNEYÊ İDYOMAN	83
Kafur SEÇİLMEK	
TEMSÎLA DENGÊN KURDÎ DI ALFABEYÊN KURMANCÎ, SORANÎ Û ZAZAKÎ YÊN BI TÎPÊN EREBÎ Û LATÎNÎ DE ..	111
Hüseyin KAÇMAZ	
EDEBİYATÊ ZAZAKÎ DI CAYÊ NUŞTOĞANÊ SÊWREGIJAN	131
Murat VAROL	
ZAZAKÎYA ÇOLIGÎ U SÊWREG DI İZAFEVÎ	141
Ayetullah KARABEYESER	
MOLUDÊ BABIJÎ SERA TİVERANAYİŞÊ ZAZAKÎYA SÊWREG U BOGLONÎ	149
İsmail SÖYLEMEZ	

MILLA CIMAYO BABIJIN ZAZACA SİYERÊ NEBÎ ESERİNİN ŞEKİL ve MUHTEVA BAKIMINDAN DEĞERLENDİRİLMESİ	165
Hatip ERDOĞMUŞ	
WEKÎ HEREMEKE TRANSÎT KURMANCÎYA BERFIRATA SIWEREGÊ	183
Mehmet YONAT	
“PEPÛKÎ MA RÊ ÇI VANA”: BÎ AWAYEKÎ MIQAYESEYÎ NIRXANDINEK LI SER EFSANEYA PEPÛKÊ DI KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DE	197
Ömer DELİKAYA Zafer AÇAR	
MULEMME'A PÊNC-ZIMANÎ YA ÎBRAHÎM RE'FETÊ SÊWREGÎ (1875-1938) Û CİHÊ WÊ DI MULEMME'NÛSÎYA KURDÎ DE	217
M. Zahir ERTEKÎN Abdulhadi ERTEKÎN	
ANALÎZEK LI SER MULEMME'ÊN OSMAN EFENDÎYÊ BABIJ	231
M. Zana KARAK	
REWŞENBÎREKE KURD LI MISRÊ MUHEMMED ELÎ EWNÎ SOREKÎ (1897-1952)	249
Nesim SÖNMEZ	
ZAZACAYA ADANMIŞ BİR ÖMÜR: HOCA ŞABAN ŞENATEŞ	265
Ali İLHAN	
HİLMÎYÊ SÊWREGÎ Û DI EDEBÎYATA KURDÎ DE CİHÊ WÎ	283
Seher BİŞAROĞLU	
DENGBÊJÎ Û DENGBÊJÊ NAVDAR Ê SÊWREGÊ ŞUKRÎ İZOL	297
Mesut CANDAN	
SİVEREK'TE KÂDİRİYYE TARİKATI	313
Abdurrahim ALKIŞ	
SÊWREGI DE EDEBİYATÊ DİNÎ RA NİMÛNEYÊK: TERAWÎHNAMEYÊ HECÎ HUSEYİNÊ TİLÎ	329
Ahmet KIRKAN	
CUMA ÖZUSAN (MİLLA CIMAYO BABIJ) ve “SİYERÊ NEBÎ BÎ ZİWANÊ DİMİLÎ” ADLI MANZUM ESERİ	349
Cuma KARAN	

ANALÎZEK LI SER MUCÎZEYÊN HZ. PÊXEMBER ÊN DI MEWLÛDNAMEYA USMAN ESAD EFENDÎYO BABIJ DE ..381
Ayhan YILDIZ

SÎVEREKLÎ DÎVÂN ŞAİRÎ İBRAHİM RE’FET’İN ŞİİRLERİNDE PEYGAMBERLER ve DİĞER DİNÎ ŞAHSİYETLER. 395
Halil KIZILTOPRAK

SÎVEREKLÎ İBRAHİM RE’FET’İN MEVLİD’İNDE HZ. PEYGAMBER..... 405
İdris SÖYLEMEZ

HETÊ ZONÎ RA TÎVERANAVÎŞÊ MOLUDANÊ XASÎ U BABIJÎ 425
İsmail SÖYLEMEZ

**SÎVEREK ASILLI MUHAMMED ALÎ el-KÛRDÎ’NİN *el-MEVSU’ ATÛ’L-KÛBRÂ LÎ MEŞÂHİRÎ’L-KURD*
‘ABRE’T-TÂRÎH ADLI ESERİNDEKİ KIRAAT ÂLİMLERİ 437**
Rifat ABLAY

**MUHAMMED ALÎ ES-SÎWÊREKÎ EL-KÛRDÎ’NİN
“MÛ’CEMU E’LAMÎ’L-KÛRD” ADLI ESERİNDE GEÇEN KÛRT KIRAAT ÂLİMLERİ 453**
Mustafa ACAR

TERZÎZÂDE HÂFİZ FİKRÎ EFENDÎ ve SÎVEREK’TEKİ KUR’ÂN EĞİTİMİ ÇABALARI 471
Lokman ŞAN

SÊWREGI RA TAYE NUMÛNEYÊ SANIKAN 479
Kafur SEÇİLMEK

NİMÛNEYÊ EDEBİYATÊ ZAZAKÎ YÊ KLASİKÎ: SÊWREGI RA ÇEND BEYTÊ DÎNÎ 503
Murat BAŞARAN

SÎVEREK SINIRLARINDA BİR DIMİLÎ AŞİRETİ: KARACADAĞ MEHELİLERİ 523
Pınar YILDIZ

DI ROMANÊN MEHMET UZUN DE POZİSYONA ÇANDÊ..... 555
Mehmet Şirin FİLİZ

BI FEKÊ SÊWREGÎ YA HEWT ESTANİKÎ..... 561
Yakup TAŞÇI

SËWREGİ DE EŞİRË ZAZAYAN (DIMİLİYAN)Û ZAZAKİYA (DIMİLKİYA) İNAN	579
Murat BAŞARAN	
SİVEREK'TE DİN ve TOPLUM İLİŞKİLERİ.....	595
Tuba ÖKENEK	
POPÜLER DİNDARLIK BAĞLAMINDA KOÇ ALİ BABA TÜRBESİ	613
Behlül TOKUR Zeynep ORTAKAYA	
SİVEREK'TE KAYBOLMAKTA OLAN GELENEKSEL BİR GİYİM KUŞAM UNSURU: İGGAL/EGAL	623
Hanım Handan AĞIRMATLI	
PİRİNCİN DOĞU ASYA'DAN MEZOPOTAMYA YOLCULUĞU ve KARACADAĞ PİRİNCİ	647
Mustafa EMRE	
SİVEREKLİ RAMAZAN ÖZGÜLTEKİN'İN SİVEREK SOSYAL ve KÜLTÜRÜNE SAĞLADIĞI KAZANIMLAR	659
Muhammed Şerif AZARKAN	
URF Û ADETËN Lİ DOR RİTËN DERBASİ YËN SINETË: NİMÛNEYA HERËMA SËWREGË	671
Mesut CANDAN	

Delikaya, Ö., & Açar, Z. (2022). "Pepûkî ma rê çi vana": Bi awayekî Miqayeseşî Nirxandinek li ser Efsaneyaya Pepûkê di Kurmancî û Zazakî de. İçinde İ. Özcoşar, A. Kırkan, E. Akman, & A. Ertekin (Ed.), Medeniyetler kavşağında bir kent: Siverek dil-din-edebiyat (ss. 197-216). Çizgi Kitabevi.

"PEPÛKÎ MA RÊ ÇI VANA": BI AWAYEKÎ MIQAYESEŞÎ NIRXANDINEK LÎ SER EFSANEYA PEPÛKÊ DI KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DE

Ömer DELİKAYA*

Zafer AÇAR**

Destpêk

Yek ji çûkên herî nepenî û mîtolojîk pepûk, bi dengê xwe yê ecêb û kiryarên xwe ve di mît, efsane û çîrokan de bi rol û sembolên cihê di folklorê cihanê de cih girtiye. Her dema ku pepûk derbihara dest bi kilama xwe dike, li her dereke dinyayê, li gorî bîr û baweriyên tiştine cihê dikevin bîra merivan. Ji Asyayê heta Ewropayê, ji wir jî heta Amerîkayê çîrok û efsaneyên ku derheqê pepûkê de tînen vegêran ligel cihêrengiyên, carcar hin hevpariyên jî dihewînin. Di nav kurdan de, bi taybetî jî di nav kurmanc û zazayan de efsaneyaya pepûkê bi rêzebûyerê heta formelên dawiyê bi şeweyên gelek nêzîkî hevdu tînen vegêran ku ji nêzîkahiya wan tê fêmkirin ku ew ji heman çavkaniyê tê dizên, wê bi heman motîf û motivasyonan şikil girtiye.

Pepûk an jî kekû ku di çanda devkî ya kurdî de li herêmeke berfireh belav bûye û ew vegêraneke zindî ya rojane ye ku hê jî di bîra hevpar a gel de tê sitirandin. Bi kurt û kurmancî ev vegêrana efsaneyî bi rengê herî sereke veguherîna jinekê/mêrekî (xwişk/bira)¹ bo pepûkê ye ku di heman demê de ev guherîn di encama diayekê pêk tê ku lehenga/ê serekî yê/ya çîrokê ji Xwedê dixwaze. Di kurdî de, di piraniya guhertoyan (*variation*) de keçîkek ji ber ku bi neheqî birayê xwe yê heq dîkuje ji Xwedê nîda dike wekî ku wê bike pepûkekê û berde çolê. Li gorî baweriyê, Xwedê jî wê dike pepûk û ew jî heta ku li darê dinê emir dike, her şîna birayê xwe dike û kilama xwe ya navdar dibêje ku tê de xwe wekî failê qetla birayê xwe dupat û dubare dike.

* Dr., MEB, omerdelikayaa@gmail.com, orcid: 0000-0001-6505-5107

** Dr. Öğr. Üyesi, Zanîngeha Bingolê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, zacar@bingol.edu.tr, orcid:0000-0001-5323-9531

¹ Herçiqas di piraniya guhertoyan de zayenda karakterê çîrokê keç be jî di hin guhertoyan de ew kurê loma di wê derê me nîşaneyaya dabeşê (/) bi maneya "yan jî" bi kar anî.

Di vê çarçoveyê de, ev nivîsar hewl dide di deqên bi kurmancî û zazakî de hin hevparî û cudahiyên efsaneya pepûkê bide ber hev û hin fonksiyon û motivasyonên wan digel bikaranînên wan ên di cureyên edebî yên çîrokî de diyar bike. Digel vê yekê, ji bo wêneyekî giştî yê çûk/teyrê “pepûk”ê di nav folklorê kurdî de zelaltir be, ji hin nimûneyên folklorê cihanê tê istifadekirin û sembol, wate û fonksiyona ku pepûk digire ser xwe bi nimûneyan tê zelalkirin.

Sembol û Temsîliyeten Heyînan di Çîrok û Efsaneyan de

Ji zemanên berê vir de ji ber têkiliya însan û heyînen gerdûnê di jiyana însanan de li gorî giringiya xwe hin heyînan, heyber û diyardeyan cihekî serekî girtine û wateya jiyana wan diyar kirine. Xusûsen jî bi têkoşîna xwe ya li sirûştê, merivan gelek caran rol û wateyek dane heyînen sirûştî. Herwiha, kevir ji bo wî tiştê xurt û zexm, agir ji bo wî tiştê bihêz sembolîze kiriye. Wekî wê, merivan wate li candaran jî bar kiriye, wekî mînak heywanên mîna gur, şêr, hirç, gamêş, beran hêz û quwetê, hesp, kûçik dostaniyê û sedeqetê, ker bêfamîyê, rovî fêlbaziyê, mirîşk tirsonekiyê sembolîze dikin. Di van temsîliyetan de pirî caran dîndar û xuyana fîzîkî ya heywanan kartêker be jî lê carna reng, deng yan jî fonksiyoneke heywanî ya xusûsê wan jî derketiye pêş ji bo ku ew bibin sembola wê wesfê. Bo nimûne kundê kor piranî bi şekl û şemala xwe lê carna jî ji ber dengê xwe yê tirsbar û bitatêl wekî bêoxirî û bêyomîyê hatiye dîtin. Herwiha teyrên mîna qirik, qijik û pepûk xusûsen di çanda kurdî de ji ber deng û awazên xwe yê janbar wekî sembola belengaziyê hatine dîtin ku ev xwe di gotin û biwêjên kurdî de jî nîşan dike. Îfadeyên mîna: “Min qirrikê, min qijikê, min pepûkê, Peppûk!...” vê yekê piştrast dikin.

Efsaneyên li ser Dilqguherînê û Çavkaniyên Wan

Efsaneya pepûkê di cewher de motîfa “dilq-guherîn”ekê (*shape-shifting*) nîşan dike ku meriv ber bi heywanan vediguherin. Di folklorê kurmancî û zazayan de dilqguherîn an jî veguherîna ji merivan ber bi heywanan tenê bi efsaneya pepûkê re têkildar nîne. Ev diyardeyeke serekî ya gelek çîrok û efsaneyan e. Dema ku kesek (zêdetir jî karakterê sereke) xeta yan jî gunehê dike ji ber şerma wê dixwaze li jiyana wekî xwe nemîne, bibe heyberekê; wekî kevir, dar yan jî candarekî; wekî heywan. Ji bo vê jî daxwaz û nidayê bi lavayî dike û wisa dixwaze xwe ji wê rewşê rizgar bike da ku ji şerm û gunehê xwe dûr bikeve, qet nebe ji aliyê şekl û hebûna xwe ya fîzîkî ve. Di çîrokên bi vî teherî yê kurmancî û zazakî de meriv rastî vê veguherîna şeklî/fîzîkî tê ku ew heyînen dewa wî tê kirin piranî kevir û teyr in, carna jî heywanên din in. Ji bo daxwaza veguherînê ya ber bi heywanekî ve efsaneya hirçê gelek navdar e di nav kurmancên Serhedê

de û ev efsane hevpariyekê bi efsaneya pepûkê re nîşan dide. Ev efsane di nav zazayan de jî gelek caran tê neqilkirin. Li gorî vê efsaneyê hirç wiha peyda bûye:

“Axak hebûye sê çar heb bûkê wî hebûne, bûkeke xwe jî teze dawet kiriye anîye. Bûk hemle ye, ji xwe re kuçik dadane, her çar bûkê wî dişonê, dawêne destê hevdu. Axa tê çiqayî ji Xwedê bixwazî zengîn e, axa tê qirşekî aha pêşiya kuçik dixe, bûk jî hemle ye.

Bûk diçe dinihêre, haşayî dêlikê çêwrik derxistiye, dinhêre çêjikekî wê iş(k) bûye. Tîne tê nava xweliya agir vedide dixe bînî, dibê bira tê de bipije ku jintiyê min çek xilas kirin ez ê werim derxim bixwim. Axa tê şivek dêt de ye. Şiva xwe l’pêşiya kuçik dixe dinhêre çêjikek kuçika tê de ye, dibê “Xwedê mala min xelab ke” dibê ez ewqayî zengîn im, dibê bûka min hemle ye nebiraniya dike. Dibê anîye hatiye çêjikekî kuçika anî kiriye pêşiya agir ku bipije bixwe. Eva ku bûk dibhê bûk hema ji ber testê radibe, diqûre dibê “Xwedê nida min ji te ew e ku tu min têxî hurçekî, serê çiya xî”. Îşte hurç j’wê peyda bûye, eva bebika zika de jî zara kurîn bûye, hurç j’wê peyda bûye.”²

Wekî vê, ji bo çêbûna kosî jî efsaneyek heye ku li gorî wê; “zemanekî berê kesekî dewlemend hebûye ku herkesî genim û ceh ji wî kiriye. Lê ji bo ku ew di bazara xwe de ne durust bûye, dema jê dexil hatiye kirîn wî koda xwe tam tijî nekiriye û bi vî şiklî dexelî kiriye, Xwedê koda wî merivî kiriye qalik û ew meriv jî kiriye kosiyê nava wî qalîkî.”³ Dîsa di nav kurdan de, vegêranên curbi-cur hene yên ku kesek tê de piştî ku ji Xwedê daxwaz û nida dike, vediguhere û dibe kevir. Ev efsane herî zêde bi navê “Kevirê Bûkê” (bi tirkî wekî *Gelin Kayaları*) tê zanîn. Efsaneya Kevirê Bûkê yek ji van nimûneyan e ku di wê efsaneyê de dewatî dema bûkê siwar dikin û dibin, têne cihekî, deng bi bûkê dikeve û ji ber şerma xwe bûk vê diayê dike: “Ya rebbî tu min bikî kevirêkî” û diaya wê qebûl dibe ku digel wê dewatiyên pê re jî dibin kevir.⁴ Di hin versiyonên din de ev bûk û siwariyên pê re ji ber sebebên din dibin kevir.⁵ Herwiha divê bê zanîn ku ev efsane li seranserê Tirkiyeyê gelek berbelav e û Sakaoğlu di xebata xwe ya berfireh a bi navê *Anadolu-Türk Efsanelerinde Taş Kesilme Motifi ve Bu Efsanelerin Tip Kataloğu* de bi dirêjî behsa vê motifê û cureyên wê dike. Derbarê van efsaneyên veguherînên dilqî de meriv dibîne ku digel ku bi sedan efsane hevpar in di nav kurd û tirkan de, lêbelê di berhevkarîyên efsaneyan de li herêmên rojava ên Tirkiyeyê efsaneya pepûkê bi awayê xwe yê ku di nav kurdan de tê neqilkirin di nav tirkan de nayê dîtin. Xêncî vê yekê efsaneyên ku li herêmên kurdnişîn hatine berhevkirin, efsaneya pepûkê an ji zazakî an jî ji kurmançî hatine wergerandin ji bo tirkî û di van xebatan de jî çavkaniya eslî ya zimanê efsaneyan

² Nenêya Reşîd, Hevdîtina rû bi rû, Gundê Qopiza Jorîn, Elaşgir, Agirî, 23 Tebax 2018.

³ Nihat Oner (berhevkar), *Ji Binbîra Kurdan Baweriyên Gelêrî*, Weşanên Wardoz, Stenbol 2019, r. 80.

⁴ Fatmaya Cemîl, Hevdîtina rû bi rû, Gundê Xornasê, Elcewaz, Bilis, 18 Tîrmeh 2015.

⁵ Li navçeya Elaşgirê ya Agiriyê de li herêma bi navê Newala Dêrê de rêzekevir hene ku bi vê efsaneyê ve tèn zanîn. Li gorî baweriyê ew ji bo ku nekevin destê ûris ji Xwedê xwestine ku wan bike kevir.

nehatiye destnîşankirin.⁶ Wate, ev efsaneyên ku ji nav gel bi kurmancî û zazakî tîn neqilkirin di kitabê de bi tirkî cih girtine û nivîskarê kitabê li tu derê behs nekiriye ku kurmanc an jî zaza jî bi heman şêweyê van efsaneyan neqil dikin an jî negotiye ku ev vegêranên hevpar in di nav niştecihên cihêreng ên li Xarpêtê. Jixwe kesên ku ji wan berhev kiriye jî ji malbata Septiğoulları ne û ev malbat di nav gel de naskirî ye.

Meriv dikare destnîşan bike ku li Tirkîyeyê digel xebatên li ser qadên cuda, xebatên efsaneyan jî cihêrengiyên ziman û çandan piştguh kirine û hevpariya van vegêranên efsaneyan nedîtine ên ku di nav tirk, kurmanc û zazayan de het-ta belkî qismen jî wextê de di nava ermeniyên de berbelav bûn.

Nîqaşeke Cureyî: Efsane Yan Çîrok?

Hem di kurmancî de hem jî di zazakî de, piraniya versiyonên pepûkê di nav çîrokan de cih digirin û wekî çîrok hatine binavkirin û senifandin. Herçiqaş ji aliyê pênaseyan ve ew wekî efsane be jî ji ber guherînên hin formelên xwe ew gelek caran di zazakî de wekî sanik/estanik/vistonik û kurmancî de jî wekî çîrok hatine berhevkirin û di nav wan kitaban de cih digirin ku ji çîrok/sanikan dagirtî ne. Ji ber ku ev vegêran bi hin formelên çîrokan ve dest pê dikin di hin guhertoyan de wekî çîrok tîn senifandin û li ser cureya wê nîqaşeke berçav jî nîne. Bo nimûne, di guhertoyeke Xinisê ya bi navê “Pep û Kekî” ya bi zazakî de bi vê formelê dest pê dike: “Beno nibeno jî waye bena jî birayê xo bena.”⁷ Herwiha heman efsane di guhertoyeke bi kurmancî ya ji Bazîdê de ku nav wekî “Pepûk 1” hatiye tomarkirin wiha dest pê dike: “Hebû tunebû, xûşk û birak va hebûn.”⁸ Li gorî van formelên destpêkî yê van keresteyên folklorîk beraqil e ku meriv wan wekî çîrok bibîne lêbelê ji gelek aliyan ve pênase û ferqên di navbera çîrok û efsaneyan de diyar in û gelek caran ew bînaş in.⁹ Ji ber vê, gotî bi kurtî be jî çend taybetmendiyên efsaneyan bêne destnîşankirin.

Efsane heta niha ji aliyê gelek kesên pispor ve hatine pênasekirin û bi demê re pênase û senifandinên derheqê efsaneyan de ji nav tekamuleke berçav re derbas bûne. Pênaseya ku berhevkarekî çîrokê gelêrî yê Almaniyayê Jakob Grimm (1785-1863) û Wilhelm Grimm (1786-1859) wekî binetareke fikrî danîye û heta niha jî di nava akademîyê de meşhur e¹⁰ ku xebatên vê qadê hemû pênaseyên

⁶ İsmail Göktem, *Elazığ Efsaneleri (İnceleme-Metinler)*, Manas Yayıncılık 2006.

⁷ Alî Aydın Çiçek (arêkerdox), “Pep û Kekî”, *Saye Marû: Estanikanê Xinis û Tekmanî ra*, Weşanên Vate, Îstanbul, 2012, r.131.

⁸ Oner, Ji Binbîra Kurdan Baweriyên Gelêrî, r.103-104.

⁹ Helbet, li vir nîqaş zêdetir li ser forma tîkel a vegêrana li ser “pepûk”ê ye. Hin çîrokbêj wê bi formelên çîrokê dide destpêkirin, digel vê gelek çîrokbêj an jî kesên sade wê di forma bawerî an jî efsaneyê de vedigêrin.

¹⁰ Linda Dégh, *Legend and Blief: Dialectic of a Folklore Genre*, Indiana University Press, Bloomington and Indianapolis 2001, r. 51.

xwe dispêrinê ev e: Efsane çîrokeke ku pê tê bawer kirin û derheqê kes, bûyer an jî cihekî diyar (rastî an jî xeyalî) de tê gotin.¹¹ Ev pênasê çar faktorên sereke dihewîne:

1. Efsane bi têgiha dema dîrokî ya vegêr/çîrokbêj re li hev tê:
 - a. Efsane bi bûyereke eşkere ya dîrokî (rastî an jî xeyalî) re tê girêdan,
 - b. Efsane bi kesekî nas/diyar re girêdayî ye, ango kesekî (rastî an jî xeyalî) binavkirî yê dîrokî;
2. Efsane bi têgiha cihekî cografîk a vegêr/çîrokbêj re li hev tê, ango ew bi cihekî diyar re girêdayî ye.
3. Efsane çîrokeke rast e, herçend bi bûyerên derasayî re eleqedar be jî, ji aliyê çîrokbêj ve pê tê bawerkirin û wekî tiştêkî aidê cihana rastî ya vegêr û guhdar tê hesabandin (herçiqaş derheqê qewamên derasayî de be jî, cimaeta vegêranê baweriya xwe bi çîrokên periyar naynin).¹²

Piştî Birayên Grimm, li ser efsaneyan birek xebatên ilmî hatin kirin û efsane ji nû ve hatin pênasekirin. Lêbelê pênasayên efsaneyan yên ku heta niha ji aliyê pisporan ve hatine kirin kê-m-zêde xwe spartin xalên sereke yên ku li jor hatine destnîşankirin. Helbet, bi demê re pênasê, cure, senifandin, çarçove û ferqên sereke yên efsaneyan ji beşên folklorê yên din baştir hatin berçavkirin û taybetmendiyên efsaneyan xwe zêdetir ji xumamîyê xelas kirin. Dîsa jî bo ku babeta efsaneyê zelaltir bibe, divê meriv serî li pênasayên kesên cuda bide.

Li gorî pênaseya *Standard Dictionary of Folklore, Mythology and Legend*, efsane ji bo vegêranekê tê gotin ku pala xwe dide rastiyê, bi têkilheviya materiyalên nerîtê, li ser kesekî, cihekî an jî qewimînekê tê gotin. Helbet gelek cureyên folklorê û bi taybetî jî mît, efsane û çîrok xwedan hin hevpariyar in. Bascom, mît, efsane û çîrokan wekî kategorîyeke hunera devkî ya muhîm û berbelav dibîne û pêşniyaz dike ku terma “vegêrana pexşanî” (*prose narrative*) bo wan bê bikaranîn.¹³ William Bascom “sê cureyên vegêrana pexşanî”, “mît”, “efsane” û “çîrok”ê li gorî “cure”, “bawerî”, “dem”, “cih” û “helwest”ê disenifîne û tabloyeke bi vî rengî têderdixe:¹⁴

¹¹ Heda Jason, “Concerning the ‘Historical’ and the ‘Local’ Legends and Their Relatives”, *The Journal of American Folklore*, vol. 84, no. 331, 1971, r. 134.

¹² Jason, “Concerning the ‘Historical’ and the ‘Local’ Legends and Their Relatives”, r.134.

¹³ William Bascom, “The Forms of Folklore: Prose Narratives” *The Journal of American Folklore*, vol. 78, no. 307, 1965, pp. 3–20.

¹⁴ Bascom, “The Forms of Folklore: Prose Narratives”, r.5.

Tablo 1: Sê Cureyên Vegêrana Pexşanî

Cure	Bawerî	Dem	Cih	Helwest	Karakterên Sereke
Mît	Rastî	Rabirdûya dûr	Dinyayeke din an jî ya berê	Pîroz	Ne-meriv
Efsane	Rastî	Rabirdûya nêzik	Dinyaya niha	Pîroz an jî nepîroz	Meriv
Çîrok	Çîroksazî	Her çi dem be	Her çi cih be	Nepîroz	Meriv an jî ne-meriv

Çîrok an jî çîrçîrok vegêraneke wisa ye ku meriv dikare wan wekî “xeyalî” (*fiction*) bi nav bike.¹⁵ Çîrokbêj û guhdar dizane ku tiştên ku tê de tînen vegêran xeyalî û dûrî rastiyê ne û di heman demê de tu pîroziya wan tune ye. Ew ne wekî “dîrok”ê tînen hesibandin, dibe ku qewimîbin an jî neqewimîbin, ev yek ciddî nayê qebûlkin.¹⁶ Bi taybetî meseleya pêbaweriyê, di wexta berhevkarîya efsaneyê pepûkê de gelek eşkere bû. Kesên ku vê neqil dikin û hetta gelek kesên ku guhdar dikin rasterast pê bawer dikin. Di vê xalê de, cudabûneke berçav di navbera herdu cureyan de ango çîrok û efsaneyan de derdikeve meydanê. Efsane, cureyek ji vegêranên devkî ne ku zanîn, bawerî, feraset û pratîkên civakî yên gelêrî nîşan didin. Ew wekî vegêranên civakî ne ku tenê agahiyên derheqê wê civakê de pêşkêş dikin, di heman demê de wan bawerî û diyardeyên cihêreng eşkere dikin ku bi rengê nêzik bi bîra civakî re jî pêwendîdar in. Heta niha gelek efsaneyên li ser pepûkê yên aidî zazakî û kurmançî hatine berhevkirin û ev efsane di nav civakê de bi awayekî çalak tê vegêrandin û bi wan tê bawerkin.

Nav û Frazên Li Ser Pepûkê

Pepûk xwedî gelek cureyan e, navê cureya herî berbelav bi latînî *cuculus canorus* e ku îngilîzî jê re dibêjin *common cuckoo* û bi tirkî wekî *bayağı guguk* tê zanîn. Di kurdî de jî hem efsaneyê li ser pepûkê hem jî navê wê bi xwe li gorî herêman diguhere. Di berhevkarîyên li ser efsane û çîroka pepûkê de formula dawî ya di nav efsaneyê de cih digire li ser binavkirina pepûkê an jî efsaneyê tesîr dike. Di kurmançî de meriv dikare bibêje ku navê herî berbelav ê balindeya berbehs “pepûk” e. Reşo Zilan navê “pepwîk”ê jî wekî guhertoyeke “pepûk”ê dide.¹⁷ Herwiha li hin deveran wekî “pepik”, “pepîk”, “pêpok”, “pêpûk”, “pepû”, “pepo” û “pêpk”, “papûk”, “pepok” jî hene. Di hin deveran dengê “k” yê dawîya “pepûk”ê dibe “g” û wekî pepûg tê bilêvkin ku telafuza “p”ê nerm e.¹⁸ Herwiha di ferhenga Vateyê ya zazakî de, ev teyr/çûk bi navên wekî

¹⁵ Elliott Oring, ‘Folk Narrative’. In *Folk Groups and Folklore Genres: An Introduction*. Ed. Elliott Oring. Utah University Press, Logan, Utah 1986, r.126; William Bascom, “The Forms of Folklore: Prose Narratives”, r.4.

¹⁶ Bascom, “The Forms of Folklore: Prose Narratives”, r.4.

¹⁷ Reşo Zilan, “Balinde”, *Kurmançî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Parisê, h. 32, 2002, r. 4

¹⁸ D. Îzolî, *Ferheng: Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî Weşanên Deng*, Amed 2007, r.455-456.

“pepug”, “pepuk”, “pepû”, “pepûg” û “pepûk” hatine tomarkirin¹⁹. Navekî din ê ku ev çûk/teyr pê tê zanîn “kekû” ye.

Bi taybetî di zazakî de berhevkariyên efsaneya pepûkê gelek caran bi vî navî hatine nivîsîn. Bo nimûne, di zazakî de di guhertoya Alî Aydın Çiçek de wekî “Pep û Kekî”²⁰, di ya Alî Beytaş de “Pêpûg”²¹, di ya Xezala Şarîkî de wekî “Kekû”²², di ya Suphi Aydın de “Pepûg”²³, di ya Münevver Akbana de wekî “Keku”²⁴, di ya Büşra Gökalp de wekî “kekû”²⁵ û di ya Lerch de wekî “goyîn”²⁶ derbas dibe. Çawa ku tê dîtin di zazakî de gelek nav û fraz hene ku ji bo efsaneyê tên bikaranîn. Xêncî navê “pepûk”ê wekî navê vê çûkê “kekû” jî tê bikaranîn û ev nav jî di ferhenga Vateyê de bi van guhertoyan ve cih girtiye: “kekû”, “keko.”²⁷ Di hin berhevkariyên kurmancî de jî heman nav hatine bikaranîn, bo nimûme Paşa Amedî navê kitaba xwe daniye “Çûka Keko Peko”.²⁸ Di ferhenga Sadah Sadallah de digel pepûkê navê “kuku” jî derbas dibe ku di soranî de berbelav e.²⁹ Xêncî van yekan li hin deveran navên çûka pepûkê û dodoyê dunikil³⁰ (bi latîni *upupa*) nav hev dikeve. Ji ber ku li hin deveran navê dodoyê dunikil wekî “pûpû”, “popî”, “poping”, “pûpî”, “pûpê” û “pûpo” tê zanîn, ji aliyê hin kesan ve ev yek xelet tê fêmkirin û navê pepûkê li vî çûkê jî tê kirin. Lêbelê ev tevlihevî ji ber du sedeman pêk tînin. Yek jê ew e ku hin navên dodoyê dunikil gelek nêzîkî pepûkê ne. Bo nimûne, “pûpo” (*upupa*) pepo (*cuculus canorus*). Sedema duyem a vê tevliheviyê jî nêzîkbûna dengên van herdu çûkan e, lewra herdu bi dengên nêzî hewdu dixwînin/diçîvin.

Li ser navê pepûkê, meriv dikare destnîşan bike ku li gelek deverên dinyayê nav tînin bikaranîn ku gelek dişibin hevdu. Ji ber ku pepûk di gelek zimanan de navê xwe jî dengê xwe digire. Ango ew navekî olandar e ku bi teqlîdê bi dest ketiye. Di vê derbarê de Yuzieva ji Marttila vediguhêze û destnîşan dike ku; “ew wisa hatiye encamdan ku di %67ê navên pepûkê de, di %100ê lêkerên pepûkê

¹⁹ Grûba Xebate ya Vateyî. *Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)- Tirkî*, Weşanên Vate, İstanbul 2009, r.372.

²⁰ Çiçek, “Pep û Kekî”, *Saye Marû: Estanikanê Xînis û Tekmanî ra*, Weşanên Vate, İstanbul 2012, r.131-132

²¹ Alî Beytaş, (arêkerdox), “Şanika Pêpûgî”, *Şaîsmayîl Estanikanê Gîngîmî ra*, Weşanên Vate, İstanbul 2012, r.73-75

²² Xezala Şarîkî (arêkerdoxe), “Kekû”, *Kovara Vate*, Hûmare: 16, Zimistan, 2002, r.68-69

²³ *Suphi Aydın, Henarek – Granatäpfelchen: Welat Şêrî Ra Sonîk/Märchen aus dem Morgenland*, Landeszentrale für polistische Bildung, Hamburg, 2015, r.68-69

²⁴ Münevver Akbana (arêdayoğ), “Keku”, *Waka Lu*, Neşîrxaneyê Vir, İstanbul 2020, r.19-21.

²⁵ Gökalp di xebata xwe de li ser vê efsaneyê tehlîleke sembolîk jî dike, bin. Büşra Gökalp, *Bingöl Masallarında -Seçilmiş Örneklerde- Sembolik Masal Çözümlemeleri*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bingöl 2018, r. 47.

²⁶ Peter I. Lerch, *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldaer - Band II*, St. Petersburg 1858, r. 80-88.

²⁷ Grûba Xebate ya Vateyî. *Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)- Tirkî*, Weşanên Vate, İstanbul 2009, r.258.

²⁸ Paşa Amedî, *Çûka Peko Keko*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.

²⁹ Salah Saadallah, *Saladin's English-Kurdish Dictionary*, Weşanên Avesta, İstanbul 2000.

³⁰ Ev çûk bi van navan jî tê zanîn: Silêmanê Dunikil, Dîksilêman, Hudhud, Dawidê Dunikil, Dîkilê Silêmanî, Dawidê Dunikil, Dîkê Silêman, Hophopk, Dodoyê Dunikil, Teyrê Çawîş, Hepûşk û yd.

de û di %75ê baneşanên pepûkê de îfadeya “ku”yê derbas dibe yan bi tenê yan ji ducarî.³¹ Çawa ku tê dîtin li gelek zimanên cîhanê de navê pepûkê xwendina wê tine bira merivan³², di kurdî de jî pepû û kekû dîsa di bin tesîra xwendina vê çûkê de hatine lêkirin.

Çand serri emrê mi mendo?: Pepûk di Kilam û Baweriyên Gel de

Çi di vegêranên kurdî de çî jî di yê gelên din de be, pepûk xwedî temsîliyetekê ye ku ew ne tenê nav lê bûye sifetekê herwiha bûye sembola bûyer, heyber yan jî diyardeyan. Piştî ku pepûk wekî figûr û karakterekî ketiye nava çîrok û efsaneyan rengê xwe daye vegêranên din yê gel ku ne tenê di çîrok û efsaneyan de herwiha di baweriyên pelepûç, nifir û kilaman de jî cih digire.

Tate³³ destnîşan dike ku pepûk li Ewropayê wekî nûçegihan/mizgîndarê biharê tê zanîn û ew berpirs tê dîtin ji bo vegeza tavê, raseriya jiyane ya li ser mirinê û hêviya mehsûlhildana pir. Tate di cihekî³⁴ din yê xebata xwe de behsa roleke pepûkê ya nerênî dike ku li gorî baweriyêke pûç ya îngilîzan; dema kesek biharê pêşî dengê pepûkê bibihîze û hêj di nava nivînê xwe de be divê ew amadekariya mirina xwe bike. Herwiha di nava gelek gelên Ewropayê de û bi taybetî di nava gelê Marî de, xelk ji pepûkê dipirse bê ka çend sal emrê wan maye.³⁵ Dîsa William Thoms, di gotara xwe ya bi navê “Folklore” de, dibêje “Pepûk, tu carî nake wîtin, heta ku ew sê caran gilyazan nexwe.”³⁶ Thoms paşê nimûneyekê ji folklorê devera Yorkshireê dide ku tîkiliya di navbera gilyaz û pepûkê de destnîşan dike. Li gorî gotina wî berê li Yorkshireê, zarok li gor dargêlazê kom dibûn û ev kilam digotin:

“Pepûkê dargêlazê

Were jêr û bêje min

Ez ê çend salan emir bikim.”³⁷

Piştî ku zarok gotina li jorê ya folklorîk dibêjin, tînin dargêlazê dihejin, hejmara gêlazên ku dikevin erdê, nîşan dide bê ka ew ê çend salan emir bikin.³⁸

³¹ Kristina Yuzieva, “Bird image in the traditional vision of the Mari people (ethnolinguistic aspect): the cuckoo”, *Esuka-Jeful* 5–2, 2014, rr. 205–221

³² Nick, Davies, *Cuckoo: Cheating by Nature*, Cambridge University Press, Cambridge 2015.

³³ Peter Tate, *Flights of fancy*, NY: Delacorte 2007, r. 22-26

³⁴ Tate, *Flights of fancy*, r. 22-26

³⁵ Di nava vî gelî de dengê pepûkê tirsnak tê hesibandin, ew wekî dengêkî bêyom tê hesibandin eger meriv ji aliyê xwe yê rastê ve bibihîze. Keçên ciwan salên xwe yê mayî ji bo zewacê ji pepûkê dipirsin. Herwiha dema ku pepûk dixwîne, êdî av germ dibe ji bo sobaniyê. Bin. Kristina Yuzieva, “Bird image in the traditional vision of the Mari people (ethnolinguistic aspect): the cuckoo”. *Esuka-Jeful* 5–2, 2014, rr. 205.

³⁶ Alan Dundes, *The Study of Folklore*, Englewood Cliffs, N. J.: Prentice-Hall, 1965. r. 6.

³⁷ Alan Dundes, *The Study of Folklore*, r. 6.

³⁸ Alan Dundes, *The Study of Folklore*, r. 6.

Wekî ku ji gotina navborî ya folklorîk jî tê fêmkirin, têkilîyek di navbera pepûk û folklorê de heye û herwiha pirsra ku “ez ê çend salan emir bikim” bi awayekî ji pepûkê jî tê pirsîn. Dîsa li hin deverên dinyayê kesê ku dengê pepûkê dibihîze û wan dihejmêre di heman demê de dikare emrê xwe yê mayî hîn bibe. Pir balkêş e ku meriv baweriyeke kê-m-zêde bi heman awayî di kilameke kevn a zazakî de dibîne ku li herêma Dêrsimê hatiye tomarkirin. Guhertoyeke kilama ku bi navê “Bava Kalî” tê zanîn di hejmareke kovara Berhemê de hatiye belavkirin û her wiha di kitaba bi navê *Dersim Türküleri (Taye Lawike Dersimi)* de jî hatiye weşandin ku dîsa ji aliyê Weşanên Berhemê ve hatiye çapkirin. Kilam bi vî rengî ye:

“Ax Qeremusano, Qeremusano,
Phepugê wusari ro niso tede bîwano
Phepugo sosin, mî ra raşti vaze,
Xona çand serri emrê mî mendo?”³⁹

Wekî ku di kilama bi zazakî de jî tê dîtin, ji pepûkê tê pirsîn da ku bibêje bê ka çend sal emrê wî maye.⁴⁰ Ev, kilama bi zazakî heman baweriya pelepûkê dihewîne ku di nav zarokên Yorkshireê de jî heye. Herwiha di kilamên dengbêj/kilambêjê herî mezin ê zazayan Sey Qajî (1876-1936) de jî peyva pepûkê zaf caran derbas dibe:

[...]

Nê zalimûnê dina xortê Dêrsimî qir kerdê Cêr û cor kerdê têvirare
Dêrsimî ser o miz û duman o

Wisar na wo ame, derdê ma rê pepûk û sosin gilê koyû ra niso, biwano
Kamî zot dabî piro, va ke:

“Mirodê pêrunê çimî de bimano. Nê zalimûnê dina ferman do, vato:
“Dêrsim de az nêmano!”⁴¹

Çawa ji kilama Sey Qajî jî tê fêmkirin, pepûk hem wekî nîşaneyê biharê ye hem jî şîna kesekî dike û li ser felaketekê dixwîne. Herwiha pepûk, di wateya kesê feqîr, belengaz û evdal de jî tê bikaranîn hem di kilamên kurmancî hem jî yên bi zazakî de. Bo nimûne, di kilama navdar a Têliyê de wiha derbas dibe:

Na na welle ez ê aşiq û sewdaliyê bejn û bala Têliyê bûm,

³⁹ Hawar Tornêcengi, “Phepug Çiko, Çituri Waneno?”, *Ware*, (12) Gulan 1998, r. 52.

⁴⁰ Li vir pirs ev e: Gelo bi rastî jî di navbera dengê pepûkê û emrê merivan de têkilîyek heye? Ev pirsra li ser baweriya gel û vegêranên efsaneyî ilham daye xebateke zanistî. Li gorî xebata zanistî a li ser dengê pepûkê hatiye diyarkirin ku emirdirêjîya merivan û pircuretiya biyolojîk a deverekê bi hejmarê xwendinê pepûkê re têkildar e. Bo zêdetir agahiyên li ser vê babetê bin. Anders Pape Møller, Federico Morelli, Piotr Tryjanowski, “Cuckoo folklore and human well-being: Cuckoo calls predict how long farmers live”, *Ecological Indicators*, Vol 72, 2017, pp. 766-768.

⁴¹ M. Dogan, “Şîrê Sey Qajî”: <http://www.zazaki.net/haber/sr-sey-qaj-164.htm> (10.06.2016)

Mîna hêsîra, pepûka, evdala bi baba dewrêşê ez ê ji xwe re digirim li rûkê vê dinyayê.

Rebiyo heyrano sibeye ez ê diçûm mala bavê Teliya xwe bi mîvanî.

Mîna hêsîra pepûka evdala li ber qulikan û paca minê vê sibê ji xwe re kir guhdarî.⁴²

Dîsa li gorî baweriyeye folklorîk, pepûka ku birayê xwe kuştiye, digirî û her dema ku hêsirên wê dikeve li ser tiştêkî fer/tek ew tişt dibe cot:

“Dibêjin pepûka reben, piştî ku birayê xwe kuştiye, hêsirên çavên wê qet nesekinîne, her tim hatine bi xwar da. Pepûkê ji ber ku fera xwe winda kiriye û tim û tim li dû birayê xwe ye, wextê diçe ser darekê, dixwîne û digirî, hêsirên wê li çî bikevin, ew tişt fer be dibe cot. Gellek caran ew hêsir li şaxên daran dikevin, lewma şax bi hev va dizeliqin.”⁴³

Ji ber ku efsaneya pepûkê di nav gelê kurd de gelek zêde berbelav bûye û navê pepûkê jî li cografyayeke gelek fireh belav bûye. Ev peyv ne tenê ji bo vê pepûkê tê bikaranîn, ew jî ber çîrok û efsaneya xwe, ji nav mîtolojiyê hatiyê ketiyê nav zimanê kurdî. Di gelek ferhengan de “pepûk” wekî “bêkes” û “belengaz”, “jar”, “feqîr”, “hejar”, “reben” û hww cih digirin. Di tiştanok/mamikan de jî pepûk bi heman wateyê tê bikaranîn. Bo nimûne “rojê bûk e, şevê pepûk e?” (stêr). Di nifiran de jî gelek caran meriv rastî aqûbeta xerab a pepûkê tê “pepûk di mala bavê te de bixwîne” û di gelek cureyên devkî de meriv rastî pepûkê tê.

Pepûk Di Çanda Kurdî Ya Nivîskî De

Di edebiyata kurdî ya devkî de çîrokên têkilî teyran, xusûsen teyrên kovî cihekî giring digirin. Bo nimûne, Teyrê Enqa, Teyrê Birê Gur, Qijik, Hehecik, Kund, Goyîn, Sîmir û Pepûk teyrên serekî ne ku bûne mijara gelek vegêranên kurdî. Ev di nav hin vegêranên gelêrî de bi wate û simbolîzmên xwe ve hem peyaman digihînin hem jî nîrxên exlaqî û baweriyê pêşkêş dikin. Li vir xala girîng ew e ku “pepûk” di nav zanîn û vegêranên gel de hin wate hilgirtine û ev wate, ne tenê di biwêj û gotinên pêşiyar de herwiha di çanda nivîskî ya kurdî de jî bi heman şêwaz û temsiliyetan ve hatine şixulandin. Ji edebiyata klasîk heta edebiyata modern û sînemayê “pepûk” bûye kakilê hin vegêran û çîroksaziyan ku pê hin rastî an jî fikrên civakî û siyasî tîr ragihandin. Ji klasîkên kurdî, Melayê Cizîrî di dîwana xwe de navê teyrê goyîne dide û ew teyr digel tûtakê di vê beyta wî ya li jêr de bi zarezar û nalîna xwe ve derdikeve pêş:

⁴² Tekin Çiftçi, *Di Kilamên Evînî yê Dengbêjan de Temaya Jinê*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mêrdînê, 2012, r.157.

⁴³ Bahoz Baran, “Mabêje Heywan e, Bêzar û Ziman e”, *Folklorê Kurdistan*, h. 6, 2016, r.72

Sehergeh endelîp mestin ji bîhna werd û bişkojan

Şubhê tûtak û goyînan dinalin em di firqê da.⁴⁴

Xaniyê peyrevê Cizîrî jî piştî mirina Memî, di beşa li ser şîn û matema wî de wan kesan dişibîne goyînan ku mîna wê li ser Mem dikin nalîn, fixan û zarezar. Nalîn û girîna ku li vir bi çûka goyînê tê temsîlkirin, destnîşan dike ku ev efsane û baweriyên derheq pepûk an jî goyînê de ji mêj ve di nava kurdan de hebûne û bi heman wate û temsîlê hatine bikaranîn. Di Mem û Zînê de pepûk an jî bi navê xwe yê din “goyîn” wiha derbas dibe:

“Neyyahe û mîhreban û dayîn

Goyende bi nale şubhê goyîn”⁴⁵

Xanî jî eynî wekî Cizîrî çûka pepûkê (goyîn) bi peyva nalînê re bi kar tîne. Her wekî ku ji beytê jî tê fêhm kirin *tûtak* û *goyîn* sembola bextreşîyê ne. Di berhevokeke kurmancî de guhertoyeke pepûkê ku tê de ev teyr wekî *tûtak* e, bi vî şiklî derbas dibe:

*“Teyrê tûtakê di pêşîya pêşî da keçîkekê sêwî bûye. Birayekî wî bi navê pepûk hebûye, rojekî ji rojan dêmarîya wan tûrikekî binê wî qûl dide piştî pepûkê û kereçinekî jî dide destê tûtakê û wan bi hevra dişîne çiyayê pincarê da ku kerengan bicivînin. Tûtak çiqas kerngekî derdixîne têxe tûrika piştî pepûkê, lêbelê ji ber ku binê tûrikê qule di gazê da dikeve erdê. Ev rewş heya êvarê wisa berdewam dike. Di dema vegera ber bi malê da, Tûtak pê dihesê ku kereng di tûrikê da nemane. Li ser wê rewşê hêrsa wê tê kereçinek li serê birê xwe yê pepûk dide, birayê wê bi derba kereçinê dimire. Dema ku birayê wê dimire, ew li ser birayê xwe pir dike şîn û girîn û wiha dibêje: Pepûk, tûtak kê kuşt, min kuşt, seb çi, seb zîlka kerengekê hişk.”*⁴⁶

Wekî wê, em pepûkê di Dîwana Feqiyê Teyran de jî dibînin ku di wir de jî wekî *goyîn*, *tûtak* û li cihekî din de jî wekî *goman* derbas dibe ku mumkîn e ew jî navekî din yê pepûkê ye:

Ne çîçek man asmîn man

Ne rozanê di rengîn man

Ne goyînê di xweşxwîn man

Ne Nîsan man ne Adar e⁴⁷

Ji çarînê tê kifşê ku Feqî behsa rewşeke fîraq û wuslatê dike lê li vir navê goyînê bi taybetiyeke erênî, bi xweşxîniya wê, hildide. Di helbesteke xwe ya din de jî Feqî hem navê goyîn û hem jî tûtakê wiha radiwire:

⁴⁴ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, Transkrîpsiyon: Arif Zêrevan, Nefel, Stockholm 2004, r. 38.

⁴⁵ Ehmedê Xanî, *Memozîn*, Transkrîpsiyon, Arif Zêrevan, Nefel, Stockholm 2004, r. 265.

⁴⁶ Veysi İnci, “Motîfên Teyran di Dîwana Melayê Cizîrî da”, *Kurdîyat*, 2020, c. 2, r. 49-62.

⁴⁷ M. Xalid Sadîni, *Feqiyê Teyran, Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2003, r. 231.

Firaqê têk hirqet e
Beîd e ji xiyalê
Tutak e bi zehmet e
Bilbil ji ber cemalê
Goyîn qet xew nakete
Ku dûr e ji wîsalê⁴⁸

Di vê bendê de jî ku wekî pêncîne rêz bûye Feqî herdu navan; hem tutak û hem jî goyîne hildide û herduyan jî bi wateyeke nerênî ve, bi zehmetiyê, dûrbûnê, derî-wîsalê bi kar tîne.

Hunirê giranî
Şemala dilan î
Teyrê goman î
Dengbêjê jaran î⁴⁹

Ji nimûneyên hersê şaheserên klasîk ên kurdî jî xuya dike ku ev teyr ji demên berê de di nav kurdan de tê zanîn û sembol û temsîliyeta xwe ya îro di wan dewran de jî heye. Helbet di berhemên din yê kurdî yê nivîskî de jî ev teyr derbas dibe, lê ji bo ku behs dirêj nebe, ev nimûne bes in.

Berhevkariyên Bi Kurmancî û Zazakî Yên Di Derheqê Pepûkê De

Efsane an jî çîroka pepûkê hema hema li hemû herêmên kurdan tê zanîn û li pir der û deveran hê jî tê qalkirin û bawerkirin. Heta nika bi dehan çaran ji aliyê berhevkar û nivîskarên cuda ve ev efsaneya balkêş hatiye bidefterkirin. Wisa xuya dike ku cara ewil kesê ku efsaneyeke nêzikî vê berhev kiriye arkeolog û oryantalistê rûs Peter Ivanovich Lerch e. Peter Lerch, li kampa bajarê Roslavlê bi eskerên kurmancî û zaza re xeber dide û çîrok û meseleyên esîrên kurd tomar dike ku piraniya wan di encama Herba Qırımê (1853- 1856) de bibûn esîrên Rûsyayê. Pey re, Lerch pirtûka xwe ya berhevkariyê ya bi navê *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldaer* wekî sê cildan, bi seredorî di sala 1956-7-8an de çap dike. Di vê kitaba navborî de Lerch ji devê eskerekî bi navê Hesen ku ji gundê Qasanê ye bi zazakî çend şerên eşîran û çîrokan berhev dike. Di beşeke vê kitêbê ya bi navê *Sage vom Vogel Goin* (Efsaneya Çûka Goyîne) de çîrokek ji devê Hesen bi zazakî hatiye qeydkirin.⁵⁰ Ev çîrok, herçiqas bi navê xwe

⁴⁸ Sadinî, *Feqîyê Teyran*, r. 210

⁴⁹ Sadinî, *Feqîyê Teyran*, r. 253

⁵⁰ Heta niha gelek efsaneyên li ser pepûkê yê aidî zazakî hatine berhevkirin û ev efsane hîn jî di nav civaka zazkîaxêv de bi awayekî çalak tê vegêrandin. Ji bo hin nimûneyên berhevkariyên ji zazakî binêre: Peter I. Lerch, *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldaer* - Band II, St. Petersburg 1858, r. 80-88; Alî Aydin Çiçek (arêkerdox), "Pep û Kekî", *Sage Marû: Estanikanê Xinis û*

ne pepûk be jî tê famkirin ku ji guhertoyeke cihê ya çîroka pepûkê ye. Her wekî ku tê zanîn di nav kurdan de ji bo dehan heywanan çîrok û efsaneyên wihareng berdest in. Çîrokên heywanan ku di pareke wan a mezin de merivek di encama bûyerekê de xwe xerab derdixe an jî dixwaze ji rewşa xemgîn xelas bike, vedi-guhere heywaneke ku wî/wê ji Xwedê daxwaz kiriye.

Li gorî efsaneya ku Lerch berhev kiriye, zemanê berê jinek û mêrek hebûne û keç û kurekî wan hebûye. Piştî ku diya herdu zarokan dimire, bavê wan diçe jineke din tîne. Du sal şûn de piştî ku zarokeke dêmariyê dibe, dêmarî dibe dij-minê herdu zarokan. Keçik rojekî ji ber golikan tê, dibîne ku birayê wê tune ye. Vê yekê ji bavê xwe re dibêje, bavê wê pey re pê dihise ku jina wî ya nû kurê wî kuştiye. Paşê dema ku keçik dibîne ku birayê wê ji aliye dêmariya wan ve hatiye kuştin ji Xwedê wiha dia dike: “Ya Rabbi, ti mi yew goîne kerî.”⁵¹ Ev qeyd, ji ber ku qeydeke kevn e û di heman demê de berhevkarîyên berîn ên zazakî ne, şayanê qalkirinê bûn. Piştî vê berhevkarîyê, em heman efsaneyê, kê-m-zêde bi heman rengî di xebata Aldatmaz de dibînin:

“Goyîne, zamanê kênekade azebe bena. A bi birayê xo Wisivî sonê malî. Hata son malî çiraynenê. Wextê agêrayîşî ke ame, nîyadana ke birayê xo çin o. Nata saye kena, dota saye kena nêkena ke Wisivî nêvîmena. Birayî ra qeyir kî kesê xo çin o. Pêşewe ortê birrî de ere birayê xo fetelîna. Peynîye de ke bira nêdî, nêwazena ke şêro keye. Heqî ra wazena ke goyîne bo û birr de birayê xo saye kero. Şewanê hamnanî de birr ra vengê goyîne yeno. Kesî nêdîya ke senîn a. Tayê vanê sey bizêk a. Vanê kam ke goyîne bivîno, mireno.”⁵²

Di vê guhertoya ku Lerch bi zazakî/kirmanckî tomar kiriye, çîrçîroka dawîya efsaneyê yan jî kilama pepûkê ku wekî “pepû, pepû, kam kişt mi kişt...” tê zanîn, tune ye. Wekî yên zazakî di kurmanckî⁵³ de jî berhevkarîyên vê efsaneyê

Tekmanî ra, weş. Vate, İstanbul, 2012, r.131-132; Alî Beytaş, (arêkerdox), “Şanika Pêpûgî”, *Şaîsmayîl: Estanikanê Gingimî ra*, weş. Vate, İstanbul, 2012, r.73-75; Xezala Şarîkî (arêkerdoxe), “Kekû”, *Kovara Vate*, Hûmaza: 16, Zimistan, 2002, r.68-69; *Suphî Aydın, Henarek – Granatäpfelchen: Welat Şêrq Ra Sonûk/Märchen aus dem Morgenland*, Landeszentrale für polistische Bildung, Hamburg, 2015, r.68-69; Kadri Yıldırım, İbrahim Bingöl, Roşan Lezgin, *Edebiyatê Kirmanckî ra Nîmûneyî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2012, r. 226; Roşan Lezgin (arêkerdox), *Sanikanê Dîyarbekirî ra Guldesteyêk*, Enstituya Kelepûrê Kurdî, Duhok, 2009, r.63-65; Münevver Akbana (arêdayoğ), “Keku”, *Waka Lu*, Neşrxaneyê Vir, İstanbul, 2020, r.19-21; Büşra Gökalp, “Keku”, *Bingöl Masallarında -Seçilmiş Örneklerde- Sembolik Masal Çözümlemeleri*, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, Bingöl 2018, r.47; İbrahim Bukan, “Kekui” *Meslé o Vistonik Zazaki*, Fam Yayınları, İstanbul, 2017, r.213-115; Ayşe Kaya, (arêkerdoxe), “Kekû”, *Estanikê Bongilanî*, weş. Vate, İstanbul 2018, r. 45-46; Hawar Tornêcengi, “Sanika Phepugi”, *Ware*, (1) Gulan 1992, r.11; Hawar Tornêcengi, “Phepug Çıko, Çituri Waneno?”, *Ware*, (12) Paiza Verêne 1998, r. 52-54.

⁵¹ Ev diaya zazakî bi kurmanckî wiha ye: “Rebî, tu min bikî goyînekî”

⁵² Nadire Güntaş Aldatmaz, *Folklorê Kirmancan (Zazayan/Kirdan/Dimiliyan) Ser ro Cîgerayîşê*, Üniversiteya Artuklu Ya Mêrdîni Enstituya Ziwananê Ke Tirkîya De Cîwiyênê, Mêrdîn, 2013, r.70

⁵³ Ji bo hin nîmûneyên berhevkarîyên ji kurmanckî binêre: M. Emin Bozarşan, *Pepûk*, Weşanên Deng, 1985, Upsala; Paşa Amedî, *Çûka Keko Peko*, Weşanxaneya Nûbihar, 2012, Stenbol; Veysi İnci, Motîfên Teyran di Dîwana Melayê Cizîrî da, *Kovara Kurdîyatê*, 2020, c. 2, r. 49-62.; Rohat Alakom, *Folklor û Jinên Kurd*, Weşanên Nefel, Stockholm, 2002, r. 20; Nîhat Oner (berhevkar), *Ji Binbîra Kurdan Baweriyên Gelêrî*, Weşanên Wardoz, 2019, Stenbol., r.103-105 (guhertoya yekem: Bazîd, Gundê Berberiyê), r. 106-107 (guhertoya duyem: İdir, Gundê Panîgê).

hatine kirin ku yek ji wan ya M. Emin Bozarslan e ku di guhertoya wî de çîrok bi kurtasî wiha derbas dibe:

“Xwedayê mezin ez ê êdî çawa bikarim li rûyê dinê bijîm û wî derdê giran di dilê xwe da bigerînim. Ez ê bi kîjan rû bişêm li rûyên mirovan, xasma li rûyê baxê xwe binêrim!” Ez bibim teyrek û ji xwe re tim ber bi asûyên fire bifirim, çêtir e wek ku ez wiha mirov bimînim û di nava mirovan de bijîm. Xwedayê mezin ez ji te hêvî û tika dikim ku di wê gavê da min bikî teyrek û bi wî awayî min ji wî halî xilas bikî!”

Xwedê diaya wê qebûl kir û di wê gavê de ew kir teyrê pepûk.⁵⁴ Wekî wê di hin guhertoyên din de; bo nimûne ya ku me bi xwe berhev kiriye⁵⁵, çîrok bi heman mijarê û karakterên serekî ye lê vê carê xûşk û birayên di varyantên din de diçine kerengan, di vê varyantê de diçine te’okan û ji bo ku “te’okan” biçinin jî amûra “kergexan”ê bi kar tînin.

Tablo 2: Di Berhevkarîyên Kurmancî û Zazakî de Nimûneyên Cuda û Hevpar yê Hêmanên Efsaneya Pepûkê

Şêwezar	Karakterên Sereke	Sebebê Bûyerê	Amûra Berhevkarîyê	Amûra Çîninê	Pirsiyar	Candarê veguhertî	Encam
Kurmancî	bav, dêmarî, keç, kur (xûşk-bira)	kereng, te’ok	tûr, torbe	kergexan, kengerçîn, kêrik, kêr	Ji ber windabûna kerengan kuştina birayî/xûşkê	Pepûk, Tutak	Poşmanî, dia, şingerî
Zazakî	xwişk, bira, damarî	kenger	Tûr, tûrik	kêr (kardî), xençer	Ji ber windabûna kerengan kuştina birayî/xûşkê	Pepûk (Kekû), Goyîn	Poşmanî, dia, şingerî

Di Roman, Sînema û Şanonameyan De Pepûk

Pepûk ne tenê di folklorê de, di heman demê de, di edebiyata modern û sînemayê de jî wekî hêmaneke bingehîn a ku xwe dispêre wate û sembolên folklorîk cih digire. Dema em li sehaya weşangeriyê dinêrin bi navê pepûkê gelek lîstikên şanoyê, fîlm, kovar û pirtûkên kurmancî, zazakî û tirkî weşiyane. Ji pirtûkan hinek pirtûkên zarokan hinek pirtûkên helbestan hinek jî kurteçîrok in ku navê xwe ji çîroka pepûkê girtine. Em ê ji sehaya weşangeriyê behsa pirtûkeke zazakî û filmekî kurmancî bikin ku dikarin bibin neynika bîra civakî ya kurdan ku tê de çîroka pepûkê cihekî xwe yê zexm û firavan heye.

Di edebiyata modern a zazakî de *Kilama Pepûgî* ku yekem romana zazakî ye hem bi navê xwe hem jî bi wateya xwe ya di romanê de hatiye bikaranîn. Romana ku xwe dispêre vegêraneke dîrokî ya li ser zilm û tadeyên li ser er-

⁵⁴ Bozarslan, 2006, r.54-67

⁵⁵ Fatmaya Cemîl, Hevdîtina rû bir û, 20.05. 2022, Gundê Xornasê, Elcewaz, Bilis.

menî û kirmancên Dêrsimê bi epîgrafekê dest pê dike ku wekî çarçoveyeke fikrî roman jî ji hizra li ser vê epîgrafê ava dibe. Li ser vê nimûneya ji folklorê, nivîskar pevçûnên di navbera herdu gelan de vedibêje û bi taybetî wê êş û zilmê vedigêre ku ermeniyana kişandiyê. Kilama ku pepûk dibêje di romanê de dibe kilameke li ser kuştin û şingirêdana birayên ermenî û ku bi heman awayî di efsaneya pepûkê de cih digire. Meriv dikare bibêje ku bi vî rengî, vegêrana efsaneyê ji yekem romana zazakî ya Deniz Gündüz re dibe paşxane û bi çarçoveya destpêkî ya vegêranê ve hin peyama wateyên sembolîk tîndarî ragihandin. Helbet bi vî rengî bi rengê sembolîk ew tîndariya kurd û ermeniyana bi failbûna birê re girê dide ku xwişka xwe dakuje.

Di kurmancî de jî bi navê pepûkê filmeke kurt heye ku di sala 2013an de bi derhêneriya Özkan Küçük hatiye weşandin.⁵⁶ Fîlm li taxeke Diyarbekirê dibore. Di fîlmî de malbatek; dê, bav, keç û kurekî wan heye. Bav di girtîgehê de ye, keçîk xwendevan û lawik kevokvan e. Rojekî hezkiriyê keçîkê defterekê didê lê birayê wê dibîne. Tê li xûşka xwe hêrs dibe û gefan lê dixwe. Li ser vê, xûşk dermanan dixwe û ji xwe diçe. Birayê wê bi tirs û tatêl wê dibe nexweşxaneyê û ji bo nasnameya xûşka xwe ya li malê bîrkerî bîne vedigere. Dema nasnameyê digere defterê dibîne ku xûşka wî jê re wek diyarî çîroka pepûkê xêz kiriye. Axir, fîlm hin babetên wekî pêşhikmî, cezakirina bilez û şaşfêmkirinê li ser vê çîrokê pêşkêş dike.

Encam

Ji folklorê heta edebiyatê ji wir jî heta jiyana rojane ya kurdan meriv dibîne ku efsaneya pepûkê di nav kurmancî û zazayan de gelek zêde hatiye/tê vegêrandin. Li seranserê dinyayê, li ser pepûkê gelek (pûçe)bawerî û vegêranên devkî hene ku ne mimkin e meriv wan gişan neqil bike. Çi di vegêranên kurdî de çi jî di yên gelên din de be, pepûk xwedî temsîliyetekê ye ku ew ne tenê nav lê bûye sifetekê herwiha bûye sembola bûyer, heyber yan jî diyardeyan. Piştî ku pepûk wekî figûr û karakterekî ketiye nava çîrok û efsaneyan rengê xwe daye vegêranên din yên gel ku ne tenê di çîrok û efsaneyan de herwiha di baweriyên pelepûç, nifir û kilaman de jî cih digire.

Li Ewropayê wekî nûçegihan/mizgîndarê biharê tê zanîn û ew berpirs tê dîtin ji bo vegeza tavê, raseriya jiyana ya li ser mirinê û hêviya mehsûlhildana pir. Herwiha di nava gelek gelên Ewropayê de û di nav axêverên Îngilîzên li Amerîkayê xelk ji pepûkê dipirse bê ka çend sal emrê wan maye. Ev taybetmendî yek ji taybetmendiya herî berbelav a pepûkê ye ku di nav gelên li Ewropayê belav bûye. Di vê xebatê de, ji nimûneyên folklorîk hate bidestxistin

⁵⁶ Özkan Küçük, *Pepuk*, (Film, 2013), 00:18:27

ku baweriyeye bi vî rengî di nav kilamên kirmancên li Dêrsimê de jî tê dîtîn û ji pepûkê wiha tê pirsîn: “Çend serri emrê mi mendo?” Di nav hin gelan de, çîroka pepûkê dişibe ya kurdan, lê di nav hin gelên din de rola ku pepûk dide ser xwe bi temamî diguhere. Çîroka pepûkê an jî xurafe û pûçebaweriyên derbarê pepûkê de, bo van wekhevîyên zêde yên li pareke dinyayê belav bûne bi hevpariya xwe ya balkêş ve nîşan dide ku gelên ku tîkiliya wan a cografîk pir lawaz in di afirandina hin baweriyên pelepûç de hin hevpariyên balkêş dihewînin. Lê di vir de xala serekî ev e: Ji ber berbelaviya vê efsaneyê meriv dikare bêje ku ev efsaneyeke pir kevn e û di civakê de xwedî temsiliyetekê ye.

Ev efsaneya ku hem bi kurmançî hem jî bi zazakî tê vegêran ji karakteran heta guhertoyan gelek hevpariyên dihewîne û meriv tê derdixe ku ji çavkaniyekê tê dizên. Bi herdu şêwezaran jî pepûk carcar dibe xwîşk, carcar dibe bira, wate guhertoyên wan jî bi heman şêweyî dibin xwedî şax. Formelên ku di dawiyê de cih digirin, hem di kurmançî de hem jî di zazakî de gelek caran dişibin hevdu û peyvên ku tê de dubare dibin: kuştin, şûştin, çalkirin (veşartin) û hwd dubare dibin. Helbet li gorî herêman, bi herdu şêwezaran jî gelek guherto peyda dibin. Di guhertoyên kurmançî de herçiqas di piranî de xwîşk û bira diçin kerengan jî hin ji wan li gorî herêmê ew gihayê ku tê çinîne diguhere û dibe “keleng”, “te’ok”, “reysîk” û hwd. Ev jî tiştêkî gelek normal e, ji ber ku li gelek deveran “kereng” peyda nabe û di dewsê de gihayekî ku tê naskirin, lê hatiye zêdekirin. Hema hema piraniya herêmên zazanişin de “kenger/kereng” tê çinîne û di guhertoyên zazakî de guherînen bingehîn li ser nav nayê dîtîn: “kereng”, “kenger”, “kînger”, “kengê”⁵⁷ û hww.

Bêyî nîqaşeke dirêj a cureyî, meriv di berhevkariyên kurmançî û zazakî de dibîne ku pepûk di nava kitabên çîrokan de cih girtiye. Bi taybetî di gelek xebatên berhevkariyê yên zazakî de pepûkê digel çîrok/şanikan cih girtiye û wisa jî hatiye nirxandin. Ji ber ku gelek guherto bi formelên çîrokî yên mîna “beno nibeno jî waye bena jî birayê xo bena” an jî “cayk ben, cayk nîben yo kênek û yo zî biray yey ben” dest pê dikin, wekî kategorî di nav çîrokan de cih girtine. Ev yek destnîşan dike ku li ser cureya vê vegêranê di berhevkariyên kurdî de tevlihevî hene. Xêncî van, meriv dikare bibêje ku efsaneyên bi vî rengî yên ku şopa wan di nav civakên neteweyekî de yan jî netewên cuda yên dinyayê de tên dîtîn gelek caran behsa çandêke hevpar ya mîllî û carna ya gerdûnî dikin.

⁵⁷ Ji bo miqayeseyeye berfireh a pepûkê di zazakî de bin. Îhsan Tektaş, *Mintiqaqa Licê ra Diwês Sanikî û Versiyonane İnan: Pêveronayîş û Tehlîl*, weş. Peywend, 2021, r.118-124.

Pêvek

Pep û Kekî⁵⁸ (Zazakî)

Beno nibeno jî waye bena jî birayê xo beno. Tabî nê hurdmîna kî bêpî û bê-maye bîyê, yetîm bîyê yanî. Tabî analixa dînê cira hes nîkena. Zaf uzmuş kena, zaf vêsan verdena, bênon verdana, zaf feqîr verdana. Rocê analixa dînû tûrik dana ci vana:

Sorê ma rê kengerû bîrayê!

Binê tûrikî dirayî bîyo. Binê tûrikî dirayî beno tabî waya layik ra pîl bîya. Waye tayina pîl bîya bira qij bîyo. Tûrik do birayê xo dest, kengerû kî waya dê kena top. Tabî kengerû kena top dana birayê xo o kî keno zere tûrikî. Tayê danê arê birayê daye vano:

-Abla jî kenger bide mi ez burî.

Jî kenger kena pa dana birayê xo. Jî kenger dana ci o wo ke kerdo pa î kengerî teyna wena. Tabî tayê kengerû dane arê layik keno zerê tûrikî. Binê tûrikî diraye yo, kulî gûnenê wara. Waya dî îndî nêzdîyo ke sorê çê vana:

-Hela î tûrikî bide mi çîqa kerde top?

Beno nibeno jî waye bena jî birayê xo beno. Tabî nê hurdmîna kî bêpî û bê-maye bîyê, yetîm bîyê yanî. Tabî analixa dînê cira hes nîkena. Zaf uzmuş kena, zaf vêsan verdena, bênon verdana, zaf feqîr verdana.

Rocê analixa dînû tûrik dana ci vana:

Sorê ma rê kengerû bîrayê!

Qaytê ci kena ke qe jîkek tede çîn o. Birayê xo ra zef hêrs bena, kuna. Tabî layik doman beno, xo tam îfade kî nîkeno vano:

Abla jîkek o ke to do mi, mi o kenger werdo, mi başqê niwerdo.

Înam nîkena. Birayê xo kuna vana:

To zurû kena. Vana “ez zerê to qilaşnena ya qaytê zerê to kena, to çend tene werdê kulî bellî yo. Tabî birayê xo sale ser a meridnena ra, verê dê kena ya ke jî kengeroke aye do ci o teyna *esto* pîzê de. Jî kengeroke werdo hêna pîzê dî der o, başqa kengerî niwerdê.

Tabî eke waya dî vînena, zaf uzulmûş bena ke hebetanê î janr a vana:

Heqo mi çuçike ke, ez dewamli vajî, “pepo-keko, pepo-keko”

Heq keno çuçike, bena çuçike kuna ra çola. Vanê ke wexto beno anman, waxtê kengerû ke yeno, kengerî ke tam resenê o waxt vengê pepî tam beno erîşte. Yane o waxt vengê aye ra her çî fam beno. Vana:

⁵⁸ Çîçek, Saye Marû: Estanikanê Xinis û Tekmanî ra, r.131-132.

“Pepo keko kam kîşt
mi kîşt kam şut mi şut
kam dard we mi dard we pepo keko pepo keko”

Waxtê kengerû ke varêno, beno vera payîzî, vengê pepûgî kuno, yanî êndî fam nibeno.

Pepûk⁵⁹ (Kurmancî)

Go xûşk birak va hebûn, dîya wana mirû, bavê wana jineke teze xwestibû. Jinika jinbav, hemasa gede, keçikê va dişîne kerenga. Hemasa diçin kerenga top dikin, hildidin tînin. Rokî dîsa diçin, gede tiçe tevşo va kerenga diqetîne, keçik jî hildide dixê torbe. Hemasa heta wextekî kerenga top dikin. Wextekî gede dinêre, torbê kerenga hema vala ye. Dibêje xûşka xwe:

“Ka kereng?”

Dibêje: “Te çi diqetand min jî davîte torbe.”

Gede dibêje: “Na, yeqîn te xariye.”

Keçik sond, and, aşit, çi dibêje, birê wê îna nake. Dibêje: “De heger tu îna nakî, zikê min biqelişîne, lê binêre.”

Gede jî tîne zikê xûşka xwe diqelişîne, heqet jî keçikê kereng nexarine. Zehf poşman dibe, lê êdî zikê xûşkê qelaştîye, xûşk mirîye. Gede ser xûşka xwe de usa digirî, xwe diperitîne. Wextekî dirêj ser xûşka xwe da digirî, paşê radibe tevşo ve erdê dikole, xûşka xwe ç’el dike. Hemasa ser mezêlê xûşkê da digirî, êdî hal dikeve. Dua dike, dibêje:

“Xwedê tu min têxî teyrekî, berî van rast besta bidî, ez hemasa bigirîm, derdê xûşka xwe bêjim.”

Xwedê jî lê tê rehmê, dua wî qebûl dike, wî dixê pepûk. Beriya wê pepûk tune bûne. Îja wextê dibe pepûk tê hemasa ser kerengê da tûk dike, çimkî sewa kerengê xûşka xwe kuştîye. Dibêjin payîza tiştêkî mîna tûkê ser kerenga çêdibe, a ewa tûka pepûkê ye. Pepûk tê ser da tûk dike. Piştî tê ser kerengê da tûk dike, xwe dide serê darekî, ya cîkî, dibêje:

“Pepûk, kê kuşt?”

Dîsa xwe, xwe re dibêje:

“Min kuşt”

Dibêje:

“Kê şuşt?”

⁵⁹ Nîhat Oner (berhevkar), *Ji Binbîra Kurdan Baweriyên Gelêrî*, Weşanên Wardoz, Stenbol 2019, r. 106-107.

Dîsa xwe, xwe re dibêje:

“Min şûşt.”

Dibêje:

“Kê dêran?”

Dibêje:

“Min dêran.”

Çavkanî

Akbana, Münevver (arêdayoğ), *Waka Lu*, Neşîrxaneyê Vir, İstanbul 2020.

Akman, İlyas, “Zaza Romancılığı.” A. Kirkan, N. Beltekin (Ed.) içinde, *Sözden Yazıya Zazaca*, Peywend Yayınları, İstanbul 2019.

Aldatmaz, Nadire Güntaş, *Folklorê Kirmancan (Zazayan/Kirdan/Dimiliyan) Ser ro Cîgerayîşê*, Ünîversîteya Artuklu Ya Mêrdînî Enstîtuya Ziwananê Ke Tirkîya De Ciwîyenê, Mêrdîn 2013.

Amedî, Paşa, *Çûka Keko Peko*, weş. Nûbihar, Stenbol 2012.

Aydin, Suphi, Henarek – Granatäpfelchen: Welat Şêrq Ra Sonîk/Märchen aus dem Morgenland, Landeszentrale für polistische Bildung, Hamburg 2015.

Baran, Bahoz, “Mabêje Heywan e, Bêzar û Ziman e”, *Folklorê Kurdan*, h. 6, 2016.

Bascom, William, “The Forms of Folklore: Prose Narratives.” *The Journal of American Folklore*, vol. 78, no. 307, 1965, pp. 3–20.

Beytaş, Alî (arêkerdox), *Şaîsmayîl: Estanikanê Gimgimî ra*, weş. Vate, İstanbul 2012.

Bozarslan, M. Emin, *Pepûk*, weş. Deng, Diyarbakir 2006.

Bukan, İbrahim, *Meslé o Vistonik Zazaki*, Fam Yayınları, İstanbul, 2017.

Çiçek, Alî Aydin (arêkerdox), *Saye Marû: Estanikanê Xinis û Tekmanî ra*, weş. Vate, İstanbul 2012.

Çiftçi, Tekin, *Di Kilamên Evînî yên Dengbêjan de Temaya Jinê*, Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî, Zanîngeha Mêrdînê, 2012.

Davies, Nick, *Cuckoo: Cheating by Nature*, Cambridge University Press, Cambridge 2015.

Dégh, Linda, *Legend and Blief: Dialectic of a Folklore Genre*, Indiana University Press, Bloomington and Indianapolis 2001.

Dundes, Alan, *The Study of Folklore*, N. J.: Prentice-Hall 1965.

Düzgün, Mustafa (ed.), *Dersim Türküleri (Taye Lawike Dersimi)*, Berhem Yayınları, Ankara 1992.

Ehmedê Xanî, *Memozîn*, Transkripsiyon, Arif Zêrevan, Nefel, Stockholm 2004

Fatmaya Cemîl, Hevdîtina rû bir û, *Gundê Xornasê, Elcewaz*, Bilîs. 20 Gulan 2022.

Gökalp, Büşra, *Bingöl Masallarında-Seçilmiş Örneklerde-Sembolik Masal Çözümlemeleri*, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü*, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bingöl 2018.

- Göktem, İsmail, *Elazığ Efsaneleri (İnceleme-Metinler)*, Manas Yayıncılık 2006.
- Grûba Xebate ya Vateyî. Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)- Tirkî, Vate, İstanbul 2009.
- Gunduz, Deniz, *Kilama Pepûgî*, Vartan Yayınevi, Ankara 2000.
- İnci, Veysi, Motîfên Teyran di Dîwana Melayê Cizîrî da, *Kovara Kurdiyatê*, 2020, c. 2, r. 49-62.
- Jason, Heda, "Concerning the 'Historical' and the 'Local' Legends and Their Relatives." *The Journal of American Folklore*, vol. 84, no. 331, 1971, 134-144.
- Kaya, Ayşe, (arêkerdoxe), *Estanikê Bongîlanî*, weş. Vate, İstanbul 2018.
- Küçük, Özkan, *Pepûk*, (Film, 2013), <https://www.youtube.com/watch?v=hwxVwXvs5Cc>,
- Lerch, Peter I., *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldaer - Band II*, St. Petersburg, 1858.
- Lezgîn, Roşan (arêkerdox), *Sanikanê Dîyarbekirî ra Guldesteyêk*, Enstîtuya Kelepûrê Kurdî, Duhok 2009.
- M. Dogan, "Şîrê Sey Qajî": <http://www.zazaki.net/haber/sr-sey-qaj-164.htm> (10.06.2016)
- Møller, Anders Pape, Morelli, Federico, Tryjanowski, Piotr, "Cuckoo folklore and human well-being: Cuckoo calls predict how long farmers live", *Ecological Indicators*, Vol 72, 2017, pp. 766-768.
- Nenêya Reşîd, Hevdîtina rû bi rû, Gundê Qopiza Jorîn, Elaşgir, Agirî, 23 Tebax 2018.
- Oğuz, Öcal & Ersoy, Petek, *Türkiye'de 2006 Yılında Yaşayan Taş Kesilme Efsaneleri Mekânlar ve Anlatılar*, Gazi Üniversitesi THBMER Yayını, Ankara 2007.
- Oner, Nîhat (berhevkar), *Ji Binbîra Kurdan Baweriyên Gelêrî*, weş. Wardoz, Stenbol 2019.
- Oring, Elliott, 'Folk Narrative'. In *Folk Groups and Folklore Genres: An Introduction*. Ed. Elliott Oring. Utah University Press, Logan, Utah 1986.
- Saadallah, Salah, *Saladin's English-Kurdish Dictionary*, weş. Avesta, İstanbul 2000.
- Sadinî, M. Xalid, *Feqîyê Teyran, Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2003.
- Sakaoglu, Saim, *Anadolu-Türk Efsanelerinde Taş Kesilme Motifi ve Bu Efsanelerin Tip Kataloğu*, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara 1980.
- Şarikî, Xezala (arêkerdoxe), "Kekû", *Kovara Vate*, Hûmare: 16, Zimistan, 2002.
- Tate, Peter, *Flights of Fancy*, NY: Delacorte 2007.
- Tektaş, Îhsan, *Mintiqaya Licê ra Diwês Sanikî û Versiyonanê Înan: Pêveronayîş û Tehlîl*, weş. Peywend, Wan 2021.
- Tornêcengi, Hawar, "Phepug Çiko, Çituri Waneno?", *Ware*, (12) Paiza Verêne 1998, r. 52-54.
- Tornêcengi, Hawar, "Sanika Phepugi", *Ware*, h.1, Gulan 1992, r.11.
- Webster, Richard, *The Encyclopedia of Superstitions*, Llewellyn, Minesota 2008.
- Yıldırım, Kadri, İbrahim Bingöl, Roşan Lezgin, *Edebiyatê Kirmanckî ra Nimûneyî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2012.
- Yıldız, Ekrem, *Kurtefilm Wekî Cih û Amûrê Bikaranîna Zimanê Kurdî*, Mardin Artuklu Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn 2020.
- Yuzieva, Kristina, "Bird image in the traditional vision of the Mari people (ethnolinguistic aspect): the cuckoo", *Esuka-Jeful* 5-2, 2014, 205-221.
- Zilan, Reşo, "Balinde", *Kurmançî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, h. 32, 2002.